Newroz Hejmar (73) Rûpel (4) Nîsan 2007z – 2619k

Nîsan heyva seyranan e

Li 13/4/2007an de , roja înê , rêxistina partiya Yekîtî ya Demoqrata Kurd ya xwendekaran li Zanîngeha Helebê , seyranek navendî ji 2000 xwenkarên Kurd yên zanîngehaq Helebê ,li Kurdaxê , li ber gola Meydankê ya rengîn li darxist.

Hêjaye bê gotin ku, ne kêmtirî

Seyrana Xewndekaran

hejmara xwendekaran , temaşevan ji vir û ji wir tevlê bûn . Pirograma şahiya seyranê ji kat 10ê sibê de , li ser şanogehê bi awaz , mûzîk û sirûda Ey Reqîb destpê bû . Herweha piştre gelek stranbêjên ji Cezîr , Kobaniyê û Efrînê stranên xweş û şêrîn pêşkêşkirin . Ji wan stranbêjan **Xesro**, Girûpa **Baran Kendeş** û stiranbêj **Welat , Rêber Armanc** , **Newroz , Zekeriya Dil Can û Sîwar** Hedad…H.W.D .

Xwendekaran jî bi xort û keçan ve , li ber dengê awaz , dahol û stiranan ji sibê ve ta dawiya şahiyê , berdewam direqisîn, didan çepik û lîliyan . Weha bi kêf , xweş û aştiyane seyran bi dawî bû û vegerîn mal .

*- Bi boneya cejna Celaê , û 22 Nîsanê roja rojnamegeriya Kurd , rêxistina P.Y.D.Ks ya karkerên Helebê bi alîkariya hin he valan ji

Şamê, seyaranek ji dora 7000kes re , li 20/4/2007an , di hembêza xwezaya **Nebî Horî** de li dar xist . Seyran ji 10ê sibê ve , bi sirûda Ey Reqîb destpê bû û pişt re bi stran , reqis û şanoyên komên filklorî mîna **Yekbon, Kurdax , xormal , Rohilat , Rojhilat, Nûhilat û Perwer** û H.W.D xweş û geş bû . Lê , bi tevanlêbûn , dîlan , çepik , dahol û lîliyên temeşevan herçû seyran xemilî û bi siruştê re bû yek.

Gotina birêz Mihyedîn Şêx Alî sekretêrê P.Y.D.Ks jî viyana xelkê germ û bi hêzkir . Herweha ta dawiyê bi awakî xweş û bê ziyan , xelkê me vegerîn malên xwe . Aqûbet li salên were bin .

Kela cehberê: Bi boneya roja rojnamegeriya Kurd, rêxistina P.Y.D.Ks ya Reqê û Girê Sipî , di 27/4/2207 an de, seyranek li **kela Ceberê** li dar xistin . Seyran bi govend, reqis û lîliyan ta dawiya rojê berdewam kir.